


# TERMINOLOJIYA ANATOMIYÊ YA BIJÎSKIYA VETERÎNERIYÊ

مندى افرا التفاقي

[www.iqra.ahlamontada.com](http://www.iqra.ahlamontada.com)

Bijîşkê Veterînerî Mûzaffer AVŞAR





# **TERMÎNOLOJIYA ANATOMIYÊ YA BIJİŞKIYA VETERİNERİYÊ**

**Bijîşkê Veterînerî Mûzaffer AVŞAR**



**VEŞANÊN KONGREYA VETERİNER BİJİŞKÊN MEZOPOTAMYAYÊ**



# **TERMÎNOLOJIYA ANATOMIYÊ YA BIJİŞKIYA VETERİNERIYÊ**

**Bijîskê Veterînerî Mûzaffer AVŞAR**



**VEŞANÊN KONGREYA VETERİNER BİJİŞKÊN MEZOPOTAMYAYÊ**

# **Termînolojiya Anatomiyê ya Bijişkiya Veterîneriyê**

Bijîskê Veterînerî  
Muzaffer Avşar

## **WEŞANÊN KONGREYA BIJÎŞKÊN VETERÎNERÎ ya MEZOPOTAMYAYÊ**

Weşanên Kongreya Bijişkên Veterînerî ya Mezopotamyayê/1  
Termînolojiya Anatomiyê ya Bijişkiya Veterîneriyê Bijş. Vet.  
Muzaffer Avşar

Berg û Mizanpaj Deniz Avşar

Çapa Yekemîn Adar 2016

Çapxane Berdan Matbaacılık

Davutpaşa Cad.Güven Sanayi Sitesi, C Blok, No:239

Topkapı-İstanbul

ISBN 978-975-6282-67-0

ZEND BİLİM KÜLTÜR EĞİTİM BASIN YAYIN LTD.Ş.T.İ.

Cibali Mah. Atatürk Bulvarı, Ünlü iş Merkezi, A Blok, Kat: 3

No:21/82

Unkapanı-Fatih/İSTANBUL

Tel: (0212) 621 82 00-37

Ew pirtûk di zimanê zanyariyê de ji bo bikaranîna zimanê kurdî mînakekê teşkil dike. Min wekî bijîskê veterînerî kefş kir ku ji bo rawekirin, vegotin, şirovekirin û lêkolînen zanyarı zimanê kurdî pir dewlemend e. Bi gencîneya peyvên xwe ve her cure mijarê dikare him devkî him jî nivîskî bide vegotin û bide nivîsin. Bi nîv ergatîviya xwe ve vegotin û nivîsran xweşiktir û bi pêşqertaf, paşqetaf û nabendêن xwe ve jî bi awayekî hêsan beraimberiya têgînêن biyanî yêن zanyarı didarişê.

Tê zanîn ku cara ewil a kedikirina heywanan û çandinî li ser erdnigariya Kurdistanê dest pê kir û li ser dinyayê belaw bû. Axa Kurdistanê ji bo çandinî û sewalkariyê zêdetirîn rewa ye, çawa ku di çaxêن berê de hîmê çandinî û sewalkariyê ji hêla gele kurd li ser axa pîroz wekî moderenîtya xwezayî hat danîn, iro jî dê bi hişmendiya modernîtya demokratîk ve hîmê çandinî û sewalkariya ekolojîk bê danîn.

Min ew pirtûk di ayendeyê de ji bo hilanîna hewcedariya pirtûka zanyarı ya bingehîn amade kir. Da ku faulteyên veterînerî yêن ku dê perwerdeya kurdî bidin bila ji aliyê vegotin û hînkariya zanîsta anatomiye de zor û zehmetiyê nekişînin.

Her wiha,

ji bo dewlemendûbna naverok û hêjaya pirtûkê, etîmolojiya 41 navêن organêن kurdî, ji hêla lêkolîner û dîrokñas Alî Huseîn Kerîm hatin şirovekirin.

Ji bo xebat û alîkariya hêja spaz dikim.

Muzaffer Avşar  
Bijîskê Veterînerî

# **Termînolojiya Anatomiyê ya Bijişkiya Veterîneriyê**

Bijişkê Veterînerî<sup>1</sup>  
Muzaffer Avşar

**WEŞANÊN KONGREYA BIJİŞKÊN VETERİNERÎ ya  
MEZOPOTAMYAYÊ**

Weşanên Kongreya Bijişkên Veterînerî ya Mezopotamyayê/1  
Termînolojiya Anatomiyê ya Bijişkiya Veterîneriyê Bijş.Vet.  
Muzaffer Avşar

Berg û Mizanpaj Deniz Avşar

Çapa Yekemin Adar 2016

Çapxane Berdan Matbaacılık

Davutpaşa Cad.Güven Sanayi Sitesi, C Blok, No:239

Topkapı-İstanbul

ISBN 978-975-6282-67-0

**ZEND BİLİM KÜLTÜR EĞİTİM BASIN YAYIN LTD.Ş.T.İ.**

Cibali Mah.Atatürk Bulvarı, Ünlü iş Merkezi, A Blok, Kat: 3

No:21/82

Unkapanı-Fatih/İSTANBUL

Tel: (0212) 621 82 00-37

Ew pirtûk di zimanê zanyariyê de ji bo bikaranîna zimanê kurdî mînakekê teşkîl dike. Min wekî bijîskê veterînerî kefş kir ku ji bo rawekirin, vegotin, şirovekirin û lêkolînê zanyarı zimanê kurdî pir dewlemend e. Bi gencîneya peyvîn xwe ve her cure mijarê dikare him devkî him jî nivîskî bide vegotin û bide nivîsin. Bi nîv ergatîviya xwe ve vegotin û nivîsran xweşiktir û bi pêşqertaf, paşqetaf û nabendên xwe ve jî bi awayekî hêsan beraimberiya têgînêni biyanî yên zanyarı didarişê.

Tê zanîn ku cara ewil a kedikirina heywanan û çandinî li ser erdnîgariya Kurdistanê dest pê kir û li ser dînyayê belaw bû. Axa Kurdistanê ji bo çandinî û sewalkariyê zêdetirîn rewa ye, çawa ku di çaxêن berê de hîmê çandinî û sewalkariyê ji hêla gele kurd li ser axa pîroz wekî moderenîtyea xwezayî hat danîn, iro jî dê bi hişmendiya modernîtyea demokratik ve hîmê çandinî û sewalkariya ekolojîk bê danîn.

Min ew pirtûk di ayendeyê de ji bo hilanîna hewcedariya pirtûka zanyarı ya bingehîn amade kir. Da ku faulteyên veterînerî yên ku dê perwerdeya kurdî bidin bila ji aliyê vegotin û hînkariya zanîsta anatomiye de zor û zehmetiyê nekişînin.

Her wiha,

ji bo dewlemendûbna naverok û hêjaya pirtûkê, etîmolojiya 41 navêن organêن kurdî, ji hêla lêkolîner û dîrokñas Alî Huseîn Kerîm hatin şirovekirin.

Ji bo xebat û alîkariya hêja spaz dikim.

Muzaffer Avşar  
Bijîskê Veterînerî

## NAVEROK

Pêşgotin.....	8-10
Têginên ku di zanîsta anatomiyê de têñ bikaranin.....	10-14
Pênasina nomenclatur, têgîn û terminolojiyê.....	16
Zimanê latinî ( lingûa latina ).....	16-17
Alfabeya latinî.....	17-18
Pevdengên (diftong) Alfabeya Latini.....	17-22
Di zimanê latinî de cureyên peyvan.....	22
Navdêr (Nomen sùbstantivûm).....	22
Di zimanê latinî de ji aliyê taybetiyên zayendî ve rewşa navdêran.....	22-24
Di zimanê kurdî zaravayê kurmancî de pirjimarı.....	24-31
Kêşana navdêran (Declinatio).....	31-32
I'emin Navdêrên Kêşanê (Prîma declinatio).....	32-33
II'emin Navdêrên Kêşanê (Secûnda declinatio).....	33-35
III'emin Navdêrên Kêşanê (Tertiâ declinatio).....	35-41
IV. Navdêrên kêşanê (Quarta declinatio).....	41-42
V. Navdêrên kêşanê (Quinta declinatio).....	42-43
Ji lêkaran dariştina navdêran.....	43-44
Di zimanê latinî de qertafênu ku wateya çûçikbûnê didin.....	44-45
Navdêrên homonîm.....	45-46
Navdêrên metonîm.....	46
Navdêrên eponîm.....	46-50
Raveka navdêrê.....	50-51
Nomen adjectivûm- Rengdêr(hevalnav).....	51
Rengdêrên yekqertafî.....	52-53
Rengdêrên duqertafî.....	53-56
Rengdêrên sêqertafî.....	56-59
Rengdêrên ku ji lêkeran têñ dariştin.....	59-60
Rengdêrên ku ji navdêran têñ dariştin.....	60-61
Di rîngdêran de hevrûkirina pileyan.....	62-63
I. Rengdêrên kêşanê(prîma declinatio).....	63-64
Rengdêrên dirbî(dirûvî).....	64
II. Rengdêrên kêşanê(secûndadeclinatio).....	64-65
III. Rengdêrên kêşanê(tertiadeclinatio).....	66-68
Di zimanê latinî de gîhanek(conjunctio).....	68
Di zimanê latinî de daçek (preposition).....	68-69
Beranberiya tirkî ú kurdi yêñ têginên latinî -tipa A.....	70-76

Beranberiya tirkî ú kurdî yên têginên latinî -tipa B.....	77-79
Beranberiya tirkî ú kurdî yên têginên latinî -tipa C.....	80-92
Beranberiya tirkî ú kurdî yên têginên latinî -tipa D.....	93-97
Beranberiya tirkî ú kurdî yên têginên latinî -tipa E.....	98-102
Beranberiya tirkî ú kurdî yên têginên latinî -tipa F.....	103-107
Beranberiya tirkî ú kurdî yên têginên latinî -tipa G.....	108-110
Beranberiya tirkî ú kurdî yên têginên latinî -tipa H.....	111-114
Beranberiya tirkî ú kurdî yên têginên latinî -tipa I.....	115-119
Beranberiya tirkî ú kurdî yên têginên latinî -tipa J.....	120
Beranberiya tirkî ú kurdî yên têginên latinî -tipa K.....	120
Beranberiya tirkî ú kurdî yên têginên latinî -tipa L.....	121-125
Beranberiya tirkî ú kurdî yên têginên latinî -tipa M.....	126-132
Beranberiya tirkî ú kurdî yên têginên latinî -tipa N.....	133-134
Beranberiya tirkî ú kurdî yên têginên latinî -tipa O.....	135-138
Beranberiya tirkî ú kurdî yên têginên latinî -tipa P.....	139-152
Beranberiya tirkî ú kurdî yên têginên latinî -tipa Q.....	153
Beranberiya tirkî ú kurdî yên têginên latinî -tipa R.....	154-157
Beranberiya tirkî ú kurdî yên têginên latinî -tipa S.....	158-170
Beranberiya tirkî ú kurdî yên têginên latinî -tipa T.....	171-186
Beranberiya tirkî ú kurdî yên têginên latinî -tipa Ü.....	177-178
Beranberiya tirkî ú kurdî yên têginên latinî -tipa V.....	179-183
Beranberiya tirkî ú kurdî yên têginên latinî -tipa X.....	184
Beranberiya tirkî ú kurdî yên têginên latinî -tipa Z.....	185
Etîmolojiya navê laş.....	186-192
Etîmolojiya navê çerm.....	193-195
Etîmolojiya navê goşt.....	195-197
Etîmolojiya navê xwîn.....	198-200
Etîmolojiya navê hestî .....	200
Etîmolojiya navê parsû.....	201-202
Etîmolojiya navê seri.....	202-204
Etîmolojiya navê kilox.....	204-205
Etîmolojiya navê mêtî.....	205
Etîmolojiya navê enî.....	206
Etîmolojiya navê birû.....	206-207
Etîmolojiya navê çene.....	207-208
Etîmolojiya navê çev.....	208-209
Etîmolojiya navê guh.....	209-210
Etîmolojiya navê por.....	211-212
Etîmolojiya navê hesti.....	212-213
Etîmolojiya navê poz.....	213-214

# NAVEROK

Pêşgotin.....	8-10
Têginên ku di zanîsta anatomiyê de têن bikaranîn.....	10-14
Pênasina nomenclatur, têgin û terminolojiyê.....	16
Zimanê latînî ( lingûa latina ).....	16-17
Alfabeya latînî.....	17-18
Pevdengêñ (diftong) Alfabeya Latinî.....	17-22
Di zimanê latînî de cureyêñ peyvan.....	22
Navdêr (Nomen sùbstantivûm).....	22
Di zimanê latînî de ji aliyê taybetiyêñ zayendi ve rewşa navdêran.....	22-24
Di zimanê kurdî zaravayê kurmancî de pirjimarî.....	24-31
Kêşana navdêran (Declinatio).....	31-32
I'emin Navdêrên Kêşanê (Prima declinatio).....	32-33
II'emin Navdêrên Kêşanê (Secûnda declinatio).....	33-35
III'emin Navdêrên Kêşanê (Tertia declinatio).....	35-41
IV. Navdêrên kêşanê (Quarta declinatio).....	41-42
V. Navdêrên kêşanê (Quinta declinatio).....	42-43
Ji lêkaran dariştina navdêran.....	43-44
Di zimanê latînî de qertafêñ ku wateya çûçikbûnê didin.....	44-45
Navdêrên homonîm.....	45-46
Navdêrên metonîm.....	46
Navdêrên eponîm.....	46-50
Raveka navdêrê.....	50-51
Nomen adjectivûm- Rengdêr(hevalnav).....	51
Rengdêrên yekqertafî.....	52-53
Rengdêrên duqertafî.....	53-56
Rengdêrên sêqertafî.....	56-59
Rengdêrên ku ji lêkeran têñ dariştin.....	59-60
Rengdêrên ku ji navdêran têñ dariştin.....	60-61
Di rêngdêran de hevrûkirina pileyän.....	62-63
I. Rengdêrên kêşanê(prima declinatio).....	63-64
Rengdêrên dirbî(dirûvî).....	64
II. Rengdêrên kêşanê(secûndadeclinatio).....	64-65
III. Rengdêrên kêşanê(tertiadeclinatio).....	66-68
Di zimanê latînî de gîhanek(conjunctio).....	68
Di zimanê latînî de daçek (preposition).....	68-69
Beranberiya tirkî û kurdi yêñ têginêñ latînî –tipa A.....	70-76

Beranberiya tirkî ú kurdî yên têginên latinî -tipa B.....	77-79
Beranberiya tirkî ú kurdî yên têginên latinî -tipa C.....	80-92
Beranberiya tirkî ú kurdî yên têginên latinî -tipa D.....	93-97
Beranberiya tirkî ú kurdî yên têginên latinî -tipa E.....	98-102
Beranberiya tirkî ú kurdî yên têginên latinî -tipa F.....	103-107
Beranberiya tirkî ú kurdî yên têginên latinî -tipa G.....	108-110
Beranberiya tirkî ú kurdî yên têginên latinî -tipa H.....	111-114
Beranberiya tirkî ú kurdî yên têginên latinî -tipa İ.....	115-119
Beranberiya tirkî ú kurdî yên têginên latinî -tipa J.....	120
Beranberiya tirkî ú kurdî yên têginên latinî -tipa K.....	120
Beranberiya tirkî ú kurdî yên têginên latinî -tipa L.....	121-125
Beranberiya tirkî ú kurdî yên têginên latinî -tipa M.....	126-132
Beranberiya tirkî ú kurdî yên têginên latinî -tipa N.....	133-134
Beranberiya tirkî ú kurdî yên têginên latinî -tipa O.....	135-138
Beranberiya tirkî ú kurdî yên têginên latinî -tipa P.....	139-152
Beranberiya tirkî ú kurdî yên têginên latinî -tipa Q.....	153
Beranberiya tirkî ú kurdî yên têginên latinî -tipa R.....	154-157
Beranberiya tirkî ú kurdî yên têginên latinî -tipa S.....	158-170
Beranberiya tirkî ú kurdî yên têginên latinî -tipa T.....	171-186
Beranberiya tirkî ú kurdî yên têginên latinî -tipa Ü.....	177-178
Beranberiya tirkî ú kurdî yên têginên latinî -tipa V.....	179-183
Beranberiya tirkî ú kurdî yên têginên latinî -tipa X.....	184
Beranberiya tirkî ú kurdî yên têginên latinî -tipa Z.....	185
Etîmolojiya navê laş.....	186-192
Etîmolojiya navê çerm.....	193-195
Etîmolojiya navê goşt.....	195-197
Etîmolojiya navê xwîn.....	198-200
Etîmolojiya navê hestî .....	200
Etîmolojiya navê parsû.....	201-202
Etîmolojiya navê serî.....	202-204
Etîmolojiya navê kilox.....	204-205
Etîmolojiya navê mêtî.....	205
Etîmolojiya navê enî.....	206
Etîmolojiya navê birû.....	206-207
Etîmolojiya navê çene.....	207-208
Etîmolojiya navê çev.....	208-209
Etîmolojiya navê guh.....	209-210
Etîmolojiya navê por.....	211-212
Etîmolojiya navê hesti.....	212-213
Etîmolojiya navê poz.....	213-214

Etimolojiya navê dev.....	215
Etimolojiya navê lêv.....	216
Etimolojiya navê ziman.....	217
Etimolojiya navê diran.....	218
Etimolojiya navê histu.....	219
Etimolojiya navê gewrî.....	219-220
Etimolojiya navê pol-sermil.....	220-221
Etimolojiya navê mil.....	221-222
Etimolojiya navê enîşk.....	222-223
Etimolojiya navê dest.....	223-224
Etimolojiya navê tilî.....	224-225
Etimolojiya navê laq-şeq.....	225-226
Etimolojiya navê jûnî.....	226-227
Etimolojiya navê pê-nig.....	227-228
Etimolojiya navê neynûk.....	228-229
Etimolojiya navê bask-per.....	229-230
Etimolojiya navê pêşîr.....	230-231
Etimolojiya navê guhan.....	231
Etimolojiya navê navik.....	232
Etimolojiya navê dil.....	232-234
Etimolojiya navê kezeb-cerg.....	234-235
Etimolojiya navê zik made(mide).....	236-237
Etimolojiya navê gun-hêlik.....	237-238
Etimolojiya navê kîr.....	239

## PÊSGOTİN

Têgîna “zanyariya zimên” cara yekemîn di nav sedsala 19emîn de hatiye bikaranîn. Têgîna zanyariya zimên di lêkolînên ku li ser ziman tê kirin de hûr û kûrbûneke teze derxist ortê û gotin û dîtinêñ xwe ji filolojiya gerdişî da vegetandin. Tê zanîn ku filoloji berî her tiştî li ser peresînêñ dîrokî yên ku bi metnêñ binivîs ve şewq vedide diseke. Yanê dê bê gotin ku xola xebata filolojiyê çand û wêje ye. Her ci-qas zanyariya zimên bi metnêñ nivîsî û guhertina ku di nav zimên de pêk tê de diseke jî, pêşîniyê di-de zimanêñ ku tên axaftin. Yanê bikurtasî dê bê gotin ku zanyariya ziman binyata zimanê aneke dîrokî çareser dike û dinirxîne.

Zanyariya zimên ji hêla zanyarêñ ziman vediqete sê makmilan. Encax; vê senifndindinê gotin û dîtinêñ cuda derxistive ortê. Zanyar li ser du binavkirinêñ makmilêñ “zanyariya zimên a giştî” û “zanyariya zimên a sepanî” hemfikirin, lê li ser binavkirina makmilê sêyemîn wekî “zanyaraiya zimên a hevrû-kirî” û “zanyariya zimên a dîrokî” dubendî heye û hêj jî didome. Ji bo vê yeke jî gelek xolêñ zanyariya ziman ên çûçük û mezin ên ku him ji aliyê naverokê, him jî ji aliyê pêkhatina parçeyen cuda ve girêdayî derketine holê.

Ji wan xolan yek jî zimanê pişê û şaxê zanyariyê ne û ji hêla kesêñ ku mensûbê şaxa zanyariyê ne tê bikaranîn û di naverok û genciniya vê de biwêj û têgîn ku bi wê şaxa zanyariyê pêwendîdarin hene. Wekî: zimanê astronomiyê, zimanê komputurê, zimanê hiqûqê, zimanê tipe û hvd.

Di çaxa ku mirovatî tê de ye de, her roj hezaran îcat û dahênanêñ nû tên dîtin û yên sereke û yên ku li gorî hewceyê ekonomiya serdest û desthilatdariya hegemonîk in dikevin meriyetê. Ew yek jî binavkir-in û rawekirin û refleks û nêzbûnîyêñ bikaranînê yên teze derdixin ortê. Yanê mirov dikare bêje ku her roj peyv û têgînêñ nû jî tevî dahênanêñ teze derdi Kevin holê û ji hêla hemû însanan ve tên bikar-anîn.

Dema ku mirov ji aliyê modernîteya kapîtalîzmê mize bike vê bê dîtin ku peresin û bikaranîna zimên jî di bin hegemoniya modernîteya kapîtalîzmê de ye. Ji bo xeritandina herdem tiştên nû, agahî û têgînêñ nû der tên û ew yek jî wekî zimanê hevpar ê şaristaniyê tê binavkirin.

Etimolojiya navê dev.....	215
Etimolojiya navê lêv.....	216
Etimolojiya navê ziman.....	217
Etimolojiya navê diran.....	218
Etimolojiya navê histu.....	219
Etimolojiya navê gewrî.....	219-220
Etimolojiya navê pol-sermil.....	220-221
Etimolojiya navê mil.....	221-222
Etimolojiya navê enîşk.....	222-223
Etimolojiya navê dest.....	223-224
Etimolojiya navê tilî.....	224-225
Etimolojiya navê laq-şeq.....	225-226
Etimolojiya navê jûnî.....	226-227
Etimolojiya navê pê-nig.....	227-228
Etimolojiya navê neynûk.....	228-229
Etimolojiya navê bask-per.....	229-230
Etimolojiya navê pêşir.....	230-231
Etimolojiya navê guhan.....	231
Etimolojiya navê navik.....	232
Etimolojiya navê dil.....	232-234
Etimolojiya navê kezeb-cerg.....	234-235
Etimolojiya navê zik made(mide).....	236-237
Etimolojiya navê gun-hêlik.....	237-238
Etimolojiya navê kîr.....	239

## PÊŞGOTİN

Têgîna "zanyariya zimên" cara yekemîn di nav sedsala 19emîn de hatiye bikaranîn. Têgîna zanyariya zimên di lêkolînênu ku li ser ziman tê kirin de hûr û kûrbûneke teze derxist ortê û gotin û dîtinênu xwe ji filolojiya gerdişî da vegetandin. Tê zanîn ku filoloji berî her tiştî li ser peresînênu dîrokî yên ku bi metnênu binivîs ve şewq vedidê disekine. Yanê dê bê gotin ku xola xebata filolojiyê çand û wêje ye. Her ci-qas zanyariya zimên bi metnênu nivîsu û guhertina ku di nav zimên de pêk tê de disekine jî, pêşîniyê di-de zimanênu ku têna axaftin. Yanê bikurtasî dê bê gotin ku zanyariya ziman binyata zimanê aneke dîrokî çareser dike û dinirxîne.

Zanyariya zimên ji hêla zanyarênu ziman vediqete sê makmilan. Encax; vê senifndindinê gotin û dîtinênu cuda derxistiye ortê. Zanyar li ser du binavkirinênu makmilênu "zanyariya zimên a giştî" û "zanyariya zimên a sepanî" hemfikirin, lê li ser binavkirina makmilê sêyemîn wekî "zanyaraiya zimên a hevrû-kirî" û "zanyariya zimên a dîrokî" dubendî heye û hêj jî didome. Ji bo vê yeke jî gelek xolênu zanyariya ziman ên çûçik û mezin ênu ku him ji aliyê naverokê, him jî ji aliyê pêkhatina parçeyen cuða ve girêdayî derketine holê.

Ji wan xolan yek jî zimanê pîşe û şaxê zanyariyê ne û ji hêla kesênu ku mensûbê şaxa zanyariyê ne tê bikaranînu û di naverok û genciniyu vê de biwêj û têgînu ku bi wê şaxa zanyariyê pêwendîdarin hene. Wekî: zimanê astronomiyê, zimanê komputurê, zimanê hiqûqê, zimanê tipe û hvd.

Di çaxa ku mirovatî tê de ye de, her roj hezaran îcat û dahênanênu tênu dîtin û yên sereke û yên ku li gorî hewcîyê ekonomiya serdest û desthilatdariya hegemonîk in dikevin meriyetê. Ew yek jî binavkir-in û rawekirin û refleks û nêzbûnîyenê bikaranînê yên teze derdixin ortê. Yanê mirov dikare bêje ku her roj peyv û têgînênu jî tevî dahênanênu teze derdikevin holê û ji hêla hemû însanan ve tênu bikar-anîn.

Dema ku mirov ji aliyê modernîteya kapitalizmê mize bike vê bê dîtin ku peresin û bikaranîna ziman jî di bin hegemoniya modernîteya kapitalizmê de ye. Ji bo xeritandina herdem tiştênu nû, agahî û têgînênu der tênu û ew yek jî wekî zimanê hevpar ê şaristaniyê tê binavkirin.

Îro li ser dinyayê her beşeke zanîstê û her pîse xweyî termî-nolojîkî ye. Termînolojî, ango têgînnasî wekî beşeke zanîstê tê qebûlkirin û bi têgîn û bikaranîna têgînan re mijûl dibe. Têgînnasî bi alîkî xwe netewî û gelêrî ye, aliyê xwe yê dîtir jî wekî navneteweyî ye. Ji aliyê navnetewî ve kurte dîroka têgînnasiyê wiha ye; dîroka têgînnasiyê wekî efsûnî bi rahîbên ewilî ve dest pê kiriye û heta îro hatiye.

Di nav dîroka mirovatiyê de têgînnasiya tipê û olê her tim li ser çanda gelan û serdestiyan tesîrên mezin kirine. Kartêke-riya têgînan girêdayî efsûniya têgînnasiyê ye. Efsûnîtî çiqasî zêde be têgînnasî jî ew qasî navneteweyî ye.

Têgînnasiya efsûnî heta sedsala 16'emin li bin bandora wekî navneteweyî berdewam kir. Di welatêr rojava de ji dû sedsala 16'emin, zimanê zanîstê her çû ji latîniyê dûr ket. Lê dîsa heta orta sedsala 20'emin têgeh û navlêkên ku rayekên zi-manê latînî û yewnanî hatibûn dariştin, li ser zîmanê zanîstê serdest bû.

Hizir û ramananê efsûnî yên ku ji çaxêr kevnare de mane, bi navberiya zimanê latînî û yewnanî li ser zimanê zanîstî te-sireke mezin pêk anîye û wekî gelempêrî û navnetevî hatiye bikaranîn.

Îro li her welatî mirovên zanîstê dixwazin ku hemû keşif û dahênen xwe bi peyv û pirsên ku di jiyanâ rojane de têr bikaranîn bigirin û wesf û çawaniya têgehê lê bar bikin.

Her wiha ji bo fêmkirineke baş û hêsan tê xwestin ku divê zimanê rojane û zimanê nivîsê jî heman be.

Ji bo hînbûneke hêsanter lazime ku her beşa zanîstê bi zimanê rojane ve bê vegotin û şîrovekirin. Jixwe îro her diçe zimanê zanîstê nêzike zimanê rojane yê ku tê bikaranîn dibe û têgeha "zimanê zanîstî yê navnetewî" holê radibe. Bi wî awayî efsûnîtiya mirovê zanîstê jî ortê radibe û zanebûn û dahênenên wan bi hewparîke gelêrî çawanîdar dibe.

## **TÊGÎNÎN KU DI ZANÎSTA ANATOMIYÊ DE TÊN BIKARANÎN**

Wekî zanîstên din, di zanîsta anatomiyê de jî gelek têgînên aîdê xwe hene û sedan salin tên bikaranîn. Piraniya ewan têgînan latînî ne, hinek jî bi yewnaniya kevn ripingir in û bi vî awayî tên binavkirin. Di her welatî de saziyêن ku perwerdehiya tipê didin de tevî beranberî zimanê zikmakî tên hînkirin.

Têgînên anatomiyê; pevvêن ku herêmên bedenê yêن diyarkirî bi awayekî vebirî terîf dikin in. Perwerdehiya anatomiyê têgînên ku pêkhatinan nîşan didin hîn dike, lê divê bi beranberiya zimanê zikmakî jî bê hînkirin û bê bikaranîn. Çimkî binavkirina zimanê zikmakî ve taybetiya erkî bi awayekî hêsan têdighîje û tê femkirin.

Destpêka verastkirina têgînên tipa anatomiyê di sala 1895'an de li bajarê Basela Îsvîçreyê bi asteke navnetewî û bi civînên zanîstî ve hatin diyarkirin. Ew civîna navnetewî wekî BNA(Basel Nomîn Anatomîca) hat binavkirin û di vê civînê de li ser biqasî 30.000 têgînên anatomiyê niqaş çêbûn. Di dawiya civînê de zimanê latînî wekî bingeh hat pejirandin û bi encema xwerûkirina têgînên anotomiyê, hejmara têgînên

Îro li ser dinyayê her beşeke zanîstê û her pîse xweyî termî-nolojîkî ye. Termînolojî, ango têgînnasî wekî beşeke zanîstê tê qebûlkirin û bi têgîn û bikaranîna têgînan re mijûl dibe. Têgînnasî bi alîkî xwe netewî û gelêrî ye, aliyê xwe yê dîtir jî wekî navneteweyî ye. Ji aliyê navnetewî ve kurte dîroka têgînnasiyê wiha ye; dîroka têgînnasiyê wekî efsûnî bi rahîbên ewilî ve dest pê kiriye û heta îro hatiye.

Di nav dîroka mirovatiyê de têgînnasiya tipê û olê her tim li ser çanda gelan û serdestiyan tesîrên mezin kirine. Kartêke-riya têgînan girêdayî efsûniya têgînnasiyê ye. Efsûnîtî çiqasî zêde be têgînnasî jî ew qasî navneteweyî ye.

Têgînnasiya efsûnî heta sedsala 16'êmîn li bin bandora wekî navneteweyî berdewam kir. Di welatêن rojava de ji dû sedsala 16'êmîn, zimanê zanîstê her çû ji latîniyê dûr ket. Lê dîsa heta orta sedsala 20'êmîn têgeh û navlêkên ku rayekên zi-manê latînî û yewnanî hatibûn dariştin, li ser zîmanê zanîstê serdest bû.

Hizir û ramananêن efsûnî yên ku ji çaxêن kevnare de mane, bi navberiya zimanê latînî û yewnanî li ser zimanê zanîstî te-sireke mezin pêk anîye û wekî gelempêrî û navnetevî hatiye bikaranîn.

Îro li her welatî mirovêن zanîstê dixwazin ku hemû keşif û dahênen xwe bi peyv û pirsêن ku di jiyanâ rojane de têن bi-karanîn bigirin û wesf û çawaniya têgehê lê bar bikin.

Her wiha ji bo fêmkirineke baş û hêsan tê xwestin ku divê zimanê rojane û zimanê nivîsê jî heman be.

Ji bo hînbûneke hêsanter lazime ku her beşa zanîstê bi zimanê rojane ve bê vegotin û şîrovekirin. Jixwe iro her diçe zimanê zanîstê nêzike zimanê rojane yê ku tê bikaranîn dibe û têgeha "zimanê zanîstî yê navnetewî" holê radibe. Bi wî awayî efsûnîtiya mirovê zanîstê jî ortê radibe û zanebûn û dahênenên wan bi hewparîke gelêrî çawanîdar dibe.

## **TÊGÎNÎN KU DI ZANÎSTA ANATOMIYÊ DE TÊN BIKARANÎN**

Wekî zanîstên din, di zanîsta anatomiyê de jî gelek têgînên aîdê xwe hene û sedan salin tên bikaranîn. Piraniya ewan têgînan latînî ne, hinek jî bi yewnaniya kevn ripingir in û bi vî awayî tên binavkirin. Di her welatî de saziyên ku perwerdehiya tipê didin de tevî beranberî zimanê zikmakî tên hînkirin.

Têgînên anatomiyê; peyvên ku herêmên bedenê yêni diyarkirî bi awayekî vebirî terîf dikin in. Perwerdehiya anatomiyê têgînên ku pêkhatinan nîşan didin hîn dike, lê divê bi beranberiya zimanê zikmakî jî bê hînkirin û bê bikaranîn. Çimkî binavkirina zimanê zikmakî ve taybetiya erkî bi awayekî hêsan têdighihêje û tê femkirin.

Destpêka verastkirina têgînên tipa anatomiyê di sala 1895'an de li bajarê Basela İsvîçreyê bi asteke navnetewî û bi civînên zanîstî ve hatin diyarkirin. Ew civîna navnetewî wekî BNA(Basel Nomîn Anatomîca) hat binavkirin û di vê civînê de li ser biqasî 30.000 têgînên anatomiyê niqaş çêbûn. Di dawiya civînê de zimanê latînî wekî bingeh hat pejirandin û bi encema xwerûkirina têgînên anotomiyê, hejmara têgînên

anatomiyê daxistin derdorê 4.500 têgînan. Di vê civînê de têgînên ku heman pêkhatinê bi zimanê curbicur bi nav dikirin hatin terkkirin. Her wiha di vê civînê de biryara bikaranîna têgînên eponîm (kesê ku cara yekemîn pêkhatinek rawe û terîf dikir li hemberî rêzgirtina xebata wî ew têgîn bi navê wî dihat navkirin) jî hat dawîkirin. Zimanê Latînî her çiqas xweyî rêzimanê be jî wekî zimanekî mirî tê qebûlkirin û alfabeşa wî jî ji 26 tîpan pêk tê û zimanekî fonetîk e. Anglo wekî çawa tê bilêvkirin û wiha jî tê nivisandin.

Ji dû civîna BNA'yê têgînên ku bi zanîsta anatomî, hîstolojî û embriyolojiyê ve têkîdarin, li her pênc sala carê ji hêla Komcivîna Anatomiştên Dinyayê ji berçevan hatin derbaskirin û hatin nûkiran. Civîna Nomîna Anatomicayê ya dawîn di sala 1985an de çêbû û di vê civînê de komeke xebatê hat avakirin û ji hêla wê komê di sala 1998an de xebata binavê "**Termînologîa Anatomîca**" yê hat weşandin. Êdî îro di pirtûkên ku ji bo zanîstên mîna anatomî, hîstolojî, embriyolojî û fîzyolojiyê têr amadekirin û têr weşandin de terîfkirina pêkhatinên anatomîk li gorî "Termînologîa Anatomîca" yê têr binavkirin û têr rawekirin.

Encax tê zanîn ku; di çaxa ku em tê de dijîn de zimanên desthilatdarên dinyayê jî wekî kapîtal û zanîstên desthilatdaran li ser dinyayê bibandor in. Yanê çaxa ku em tê de dijîn wekî "Çaxa Agahiyê" tê binavkirin, ew jî tê wê mehneyê ku li ser Dinyayê, li ser hemû zanîstan her roj dahêن, kefş û îcatêن nû têr dîtin û her diçe termonolojiya

navnetewî verdigere termonolojiya hemdem a desthilatarêñ dinyayê. Ew termonolojiya hemdem a desthilatdarêñ dinyayê hertim alîkariyê dide aboriya xerîtanê ya ne xwezayî û endustriyalîzma ne ekolojîk.

Ji bo ewan sedeman divê em wekî Bijîskêñ Veterînerî yên gele kurd li ser termonolojiya zanîstêñ mîna Anatomî, Fîzyolojî, Embriyolojî û Hîstolojiyê dest bi xebatan bikin. Xebatêñ ku em dikin bînin cî û derxin ortê jî divê li ser ewan metod û dîtinan bimeşe;

**1-Divê termonolojiya hemdem bi awayekî resen bi zimanê zikmakî ve bê hevrûkirin, rawekirin û fêmkirin.**

Ji bo ewan sedeman divê termonolojiya hemdem bi awayekî resen bi zimanê zikmakî ve bê hevrûkirin, rawekirin û fêmkirin. Yanê eger beranberiya termonolojiya desthiltdaran û ya navnetewî di nav zimanê gel de hebe divê wekî mîsoger bê bikaranîn. Çimkî; ew rîbaz fêmkirina zanîst û hînbûnê zêdetir û geştir dike, heke beranberiya ewan têgînan di nav zimanê axaftin û nivisandinê de tune bin; divê bi awayekî siruştî beranberiya vê têgînê li gorî rîzimaniyê bêñ dariştin. Her wiha divê beranberiya têgînan wekî dersiruştî neyên dariştin û wekî reseniyêñ xwe di nav termonolojiya zanîstêñ zikmakiyê de bi awayekî fehmbar bêñ bikaranîn.

Di kîjan zanîstê de dibe bila be, dema ku têgînek tê dariştin li ser ewan bingehêñ sereke der têñ.

anatomiyê daxistin derdorê 4.500 têgînan. Di vê civînê de têgînên ku heman pêkhatinê bi zimanê curbicur bi nav dikirin hatin terkkirin. Her wiha di vê civînê de biryara bikaranîna têgînên eponîm (kesê ku cara yekemîn pêkhatinek rawe û terîf dikir li hemberî rêzgirtina xebata wî ew têgîn bi navê wî dihat navkirin) jî hat dawîkirin. Zimanê Latînî her çiqas xweyî rêzmanê be jî wekî zimanekî mirî tê qebûlkirin û alfabeşa wî jî ji 26 tîpan pêk tê û zimanekî fonetîk e. Anglo wekî çawa tê bilêvkirin û wiha jî tê nivisandin.

Ji dû civîna BNA'yê têgînên ku bi zanîsta anatomî, hîstolojî û embriyolojiyê ve têkîdarin, li her pênc sala carê ji hêla Komcivîna Anatomiştên Dinyayê ji berçevan hatin derbaskirin û hatin nûkirin. Civîna Nomîna Anatomicayê ya dawîn di sala 1985an de çêbû û di vê civînê de komeke xebatê hat avakirin û ji hêla wê komê di sala 1998an de xebata binavê "**Termînologîa Anatomîca**" yê hat weşandin. Êdî îro di pirtûkên ku ji bo zanîstên mîna anatomî, hîstolojî, embriyolojî û fîzyolojiyê têr amadekirin û têr weşandin de terîfkirina pêkhatinên anatomîk li gorî "Termînologîa Anatomîca" yê têr binavkirin û têr rawekirin.

Encax tê zanîn ku; di çaxa ku em tê de dijîn de zimanên desthilatdarên dinyayê jî wekî kapîtal û zanîstên desthilatdaran li ser dinyayê bibandor in. Yanê çaxa ku em tê de dijîn wekî "Çaxa Agahiyê" tê binavkirin, ew jî tê wê mehneyê ku li ser Dinyayê, li ser hemû zanîstan her roj dahêن, kefş û îcatêن nû têr dîtin û her diçe termonolojiya

navnetewî verdigere termonolojiya hemdem a desthilatarê dinyayê. Ew termonolojiya hemdem a desthilatdarê dinyayê hertim alîkariyê dide aboriya xerîtanê ya ne xwezayî û endustriyalîzma ne ekolojîk.

Ji bo ewan sedeman divê em wekî Bijîskên Veterînerî yên gele kurd li ser termonolojiya zanîstên mîna Anatomî, Fîzyolojî, Embriyolojî û Hîstolojiyê dest bi xebatan bikin. Xebatênu em dikin bînin cî û derxin ortê jî divê li ser ewan metod û dîtinan bimeşe;

**1-Divê termonolojiya hemdem bi awayekî resen bi zimanê zikmakî ve bê hevrûkirin, rawekirin û fêmkirin.**

Ji bo ewan sedeman divê termonolojiya hemdem bi awayekî resen bi zimanê zikmakî ve bê hevrûkirin, rawekirin û fêmkirin. Yanê eger beranberiya termonolojiya desthiltdaran û ya navnetewî di nav zimanê gel de hebe divê wekî mîsoger bê bikaranîn. Çimkî; ew rîbaz fêmkirina zanîst û hînbûnê zêdetir û geştir dike, heke beranberiya ewan têgînan di nav zimanê axaftin û nivisandinê de tune bin; divê bi awayekî siruştî beranberiya vê têgînê li gorî rîzimaniyê bêñ dariştin. Her wiha divê beranberiya têgînan wekî dersiruştî neyên dariştin û wekî reseniyêne xwe di nav termonolojiya zanîstên zikmakiyê de bi awayekî fehmbar bêñ bikaranîn.

Di kîjan zanîstê de dibe bila be, dema ku têgînek tê dariştin li ser ewan bingehêne sereke der têne.

**1-Têgîn divê di nav xwe de şîrovekirina herî kurt a wê mijarê bihewîne.**

**Mînak:**

LATÎNÎ	TÎRKÎ	KURDÎ
Üterûs	Yavruluk	Malçêlik(=Malçêjik)

Di her sê zimanan de jî têgîn ji dû cotbûnan di mîyênen ku tol girtine de tê wateya rahima ku bi "yavrû", "çêjik" û "embriyo"yê re malovaniyê dike.

**2-Têgîn divê bişibe navgîneke ku di jiyana rojane de tê bikaranîn.**

**Mînak :**

LATÎNÎ	TÎRKÎ	KURDÎ
Scapûla	Scapûla	Hestiyê bêrokê

Di her sê zimanan de jî ew hestiyê ku li paş milpiyan cî digire dişibe bêrêkeke sê niçik û pehn.

**3-Têgîn divê erka navgîna ku dişibê bîne cî.**

Mînak:

LATÎNÎ	TÎRKÎ	KURDÎ
Palpebrae	Göz kapağı	Qalpaxa çev

Di her sê zimanî de jî pêkhatina ku dişibe palikê erka qalpaxê tînin cî.

**4-Ji bo nasandîna pêkhatinan navlêkên erdnîgarî û navlêkên cîh, alî û beran jî tê bikaranîn.**

Mînak:

LATÎNÎ	TÎRKÎ	KURDÎ
Anterîur	Ön	Pêş
Posterîur	Arka	Paş
Verticalîs-Horôzîntalîs	Düsey-Yatay	Şakûlî-Berwarî

**1-Têgîn divê di nav xwe de şîrovekirina herî kurt a wê mijarê bihewîne.**

Mînak:

LATÎNÎ	TÎRKÎ	KURDÎ
Üterûs	Yavruluk	Malçêlik(=Malçêjik)

Di her sê zimanan de jî têgîn ji dû cotbûnan di mîyêن ku tol girtine de tê wateya rahima ku bi "yavrû", "çêjik" û "embriyo"yê re malovaniyê dike.

**2-Têgîn divê bişibe navgîneke ku di jiyana rojane de tê bikaranîn.**

Mînak :

LATÎNÎ	TÎRKÎ	KURDÎ
Scapûla	Scapûla	Hestiyê bêrokê

Di her sê zimanan de jî ew hestiyê ku li paş milpiyan cî digire dişibe bêrêkeke sê niçik û pehn.

**3-Têgîn divê erka navgîna ku dişibê bîne cî.**

Mînak:

LATÎNÎ	TÎRKÎ	KURDÎ
Palpebrae	Göz kapağı	Qalpaxa çev

Di her sê zimanen de jî pêkhatina ku dişibe palikê erka qalpaxê tînin cî.

**4-Jî bo nasandina pêkhatinan navlêkên erdnîgarî û navlêkên cîh, alî û beran jî tê bikaranîn.**

Mînak:

LATÎNÎ	TÎRKÎ	KURDÎ
Anterîur	Ön	Pêş
Posterîur	Arka	Paş
Verticalîs- Horôzîntalîs	Düsey-Yatay	Şakûlî-Berwarî

## **TERMİNOLOJIYA ANATOMIYÊ YA BIJİŞKIYA VETERİNERİYÊ**

### **Pênasîna nomenclatur, têgîn û termînolojiyê**

**Têgîn:** Peyv û pirsên taybet ên ku ji bo besên pircure yên zanîstê û şaxên pîşe û hunerê tên bikaranîn wekî “têgîn” tên binavkirin.

Taybetiyên têgînan wekî gelempêrî wiha tên rêzkirin;

- Beranberiya têgînê divê yekem peyv be.
- Vateya têgînê divê neyê guhastin.
- Têgîn divê di nav xwe de wateyeke layen nehevîne.
- Têgîn û pênase divê ji hev cihê bin.
- Di nav hevokê de têgîn divê bi maneyên cuda neyê bikaranîn.

**Termînolojî:** Zanîsta ku bi têgînan ve mijûl dibe ye û hemû têgînen ku di nav beşeke zanîst û hunerê de cî digirin, wekî termînolojî tê zanîn û tê binavkirin. Rehdara(kok) termînolojiyê jî wekî grekî ye.

**Nomenclatur:** Pergala verastkirina têgînen ku aîdê beşa zanîstekê û hunerekî ye. Di nav zimanê latînî de tê maneyên mîna navlêkirin û navdayinê. Yanê şûna termînolojiyê tê bikaranîn.

## ZİMANÊ LATÎNÎ ( LÎNGÛA LATÎNA )

Zimanê latînî navê xwe ji herêma dîrokî ya ku navê wê wekî "Latîum" tê zanîn û di nav dabeşa navîn a Îtalyayê de cî digire hildide. Ku li ser wê herêmê bajarê Romayê hatiye damezrandin. Zimanê latînî zimanekî kevnare (antîk) ye û di nav zimanê Hînd-Ewropayê de cî digire. Zimanê latînî di dema Împaratoriya Romayê de wekî zîmanê fermî dihat.bikaranîn û di serdema qirna navîn de jî wekî zimanê dêrê hatiye bikaranîn. Lê di çaxa me de wekî sembolîk zimanê Vatîkanê tê bikaranîn. Yanê zimanekî xweyî rês û rêzikan e, lê di nav gelekî de nayê axaftin, ji bo wê yekê jî wekî zimanekî mirî tê qebûlkirin. Encax mensûbên giyanî yên girêdayî meshebêñ kataolîk di nav hev de vî zimanî diaxifin û dinivîsin.

Zimanê latînî ji aliyê taybetî û rewşa xwe ve bi wan awayan ñê bê ravekirin.

- Di nav zimanê latînî de dîroka hin peyvan ji 2000 salan zêdetir e.
- Zimanê kevnare yê latînî dema ku dihat nivîsandin, di nav peyvan de navber tune bû û xalbendî nedihat bikaranîn.
- Zimanên Erdnîgariya Ewropayê koka xwe ji zimanê latînî werdigirin.
- Zimanê latînî seranserê dîrokê bûye zimanê zanîst û zimanê kesên perwerdekirî.
- Zimanê latînî di çaxa me de wekî zimanê termînolojiyê û zimanê dêrê tê bikaranîn.
- Zimanê latînî her ciqas xweyî rês û rêzikan be jî wekî zimanê mirî tê hesibandin, ji bo wê yekê jî naguhêse û na-perise.
- Wekî zimanê bingehîn ê bijîşktiyê pêk tîne û di wê qadê de hevpariya zimanê ku tê bikaranîn peyda kiriye.
- Zimanê latînî xweyî taybetiyeke navnetevî ye.

## **TERMİNOLOJIYA ANATOMIYÊ YA BIJİŞKIYA VETERİNERIYÊ**

### **Pênasîna nomenclatur, têgîn û termînolojiyê**

**Têgîn:** Peyv û pirsên taybet ên ku ji bo besêن pircure yên zanîstê û şaxên pîşe û hunerê tên bikaranîn wekî “têgîn” tên binavkirin.

Taybetiyêن têgînan wekî gelempêrî wiha tên rêzkirin;

- Beranberiya têgînê divê yekem peyv be.
- Vateya têgînê divê neyê guhastin.
- Têgîn divê di nav xwe de wateyeke layen nehevîne.
- Têgîn û pênase divê ji hev cihê bin.
- Di nav hevokê de têgîn divê bi maneyêن cuda neyê bikaranîn.

**Termînolojî:** Zanîsta ku bi têgînan ve mijûl dibe ye û hemû têgînên ku di nav beşeke zanîst û hunerê de cî digirin, wekî termînolojî tê zanîn û tê binavkirin. Rehdara(kok) termînolojiyê jî wekî grekî ye.

**Nomenclatur:** Pergala verastkirina têgînên ku aîdê beşa zanîstekê û hunerekî ye. Di nav zimanê latînî de tê maneyêن mîna navlêkirin û navdayinê. Yanê şûna termînolojiyê tê bikaranîn.

## ZİMANÊ LATİNÎ ( LÍNGÜA LATÍNA )

Zimanê latînî navê xwe ji herêma dîrokî ya ku navê wê wekî "Latîum" tê zanîn û di nav dabeşa navîn a Îtalyayê de cî digire hildide. Ku li ser wê herêmê bajarê Romayê hatiye damezrandin. Zimanê latînî zimanekî kevnare (antîk) ye û di nav zimanê Hînd-Ewropayê de cî digire. Zimanê latînî di dema Împaratoriya Romayê de wekî zîmanê fermî dihat.bikaranîn û di serdema qirna navîn de jî wekî zimanê dêrê hatiye bikaranîn. Lê di çaxa me de wekî sembolîk zimanê Vatîkanê tê bikaranîn. Yanê zimanekî xweyî rêz û rêzikan e, lê di nav gelekî de nayê axaftin, ji bo wê yekê jî wekî zimanekî mirî tê qebûlkirin. Encax mensûbên giyanî yên girêdayî meshebêñ kataolîk di nav hev de vî zimanî diaxifin û dinivîsin.

Zimanê latînî ji aliyê taybetî û rewşa xwe ve bi wan awayan dê bê ravekirin.

- Di nav zimanê latînî de dîroka hin peyvan ji 2000 salan zêdetir e.
- Zimanê kevnare yê latînî dema ku dihat nivîsandin, di nav peyvan de navber tune bû û xalbendî nedihat bikaranîn.
- Zimanên Erdnîgariya Ewropayê koka xwe ji zimanê latînî werdigirin.
- Zimanê latînî seranserê dîrokê bûye zimanê zanîst û zimanê kesên perwerdekirî.
- Zimanê latînî di çaxa me de wekî zimanê terminolojiyê û zimanê dêrê tê bikaranîn.
- Zimanê latînî her ciqas xweyî rêz û rêzikan be jî wekî zimanê mirî tê hesibandin, ji bo wê yekê jî naguhêse û na-perise.
- Wekî zimanê bingehîn ê bijîşktiyê pêk tîne û di wê qadê de hevpariya zimanê ku tê bikaranîn peyda kiriye.
- Zimanê latînî xweyî taybetiyeke navnetevî ye.

- Her çiqas hinek têgînên bijîşktiyê ji zimanê grekî bêñ jî, lê gelem-periyêñ têgînên bijîşktiyê ji zimanê latînî kokê digirin.

## **ALFABEYA LATÎNÎ**

Alfebaya latînî 21 tîpêñ xwe ji alfabeşa Etruskan hildaye û bi tîpêñ "î" û "v" yê ve têhev ji 23 tîpêñ bingehîn pêk tê.

Lê di çaxa qirna navîn de tîpa "î" veqetiya tîpêñ "î" û "j" yê, tîpa "v" yê jî veqetiya wekî tîpêñ "u", "v" û "w" yê, bi wî awayî alfabeşa latînî gihîst 26 tîpan.

Alfabeya latînî jî wekî alfabeşa me xweyî tîpêñ girdek û hûr-dek e.

A B C D E F G H I J K L M N O P Q R S T U V W X Y Z

a b c d e f g h î j k l m n o p q r s t û v w x y z

- Tîpêñ "Y" û "Z" yê peyvêñ ku koka xwe ji grekiyê werdi-girin hildidin de tê bikaranîn.
- Tîpa "W" yê jî di têgînên cograffik de tê bikaranîn. Di terîmêñ bijîşktiyê de jî bitenê terîmêñ "Eponîm" de tê bikranîn.

Wekî alfabeşen dîtir tîpêñ latînî jî ji tîpêñ dengdêr û dengdaran pêk tê.

**Tîpêñ dengdêr ji şeş tîpan pêk têñ.**

**a, e, î, o, û, y**

**Tîpêñ dengdar jî ji bîst tîpan pêk têñ.**

**b, c, d, f, g, h, j, k, l, m, n, p, q, r, s, t, v, w, x, z**

**Nîşe:** Di Elifbeya Latînî de tîpa "î" yê û tîpa "û" yê wekî (i-u) yê ye. Lê min wekî (î -û)'yê nişan da. Çimkî bilêvkirina den-gêñ( i-u)yê di têgîn û peyvêñ latînî de wekî lêvkirina dengêñ (î -û)ya zimanê kurdî ye.

Yanê têgîna "Masûlke"yê di zimanê latînî de wekî "Musculus" tê nivîsîn û wekî denge kurdî "û"yê tê bilêvkirin. Her wiha dengê "ö û ü yê jî di zimanê kurdî de bi tîpa "u" yê ve tê nişandan. Ji bo vê yekê di nivîsîna peyv û têgînên latînî de ew her sê denge wekî rîbaza zimanê kurdî hatin bikaranîn û nişandan.

### **Pevdengê (dîftong) Alfabeya Latînî**

Taybetiya pevdengê latînî ewe ku ji du tîpêñ dengdêr pêk tên. Yanê du tîpêñ dengdêr tên jiberhev, wekî yek dengî tên xwendin. Ji wan pevdengan a ku en zêde tê baikaranîn "ae" ye.

"ae" wekî "e" tê xwendin û tê bilêvkirin.

"oe" wekî "u" tê xwendin û tê bilêvkirin.

"aû" wekî "o" an jî wekî "av" tê xwendin û tê bilêvkirin.

"eû" wekî "u" an jî wekî "eu" tê xwendin û tê bilêvkirin.

"eî" wekî "eî" tê xwendin û tê bilêvkirin.

"ûî" wekî "ûî" tê xwendin û tê bilêvkirin.

## **BILÊVKIRİNA TÎPÊN LATÎNÎ**

### **Bilêvkirina tîpêñ dengdêr**

- Tîpêñ mîna **a, e, o, û** wekî dengêñ kurdî tên bilêvkirin.
- Dengdêra "î" yê jî li rex tîpêñ dengdar wekî "î" ya kurdî, lê li rex tîpêñ dengdêr jî wekî "y"yê tê bilêvkirin.

**Mînak:** Întestînûm=Întestînûm

**Mînak:** Excavatîo = Ekskavasyo

- Tîpa "y" yê wekî "î" tê bilêvkirin.

**Mînak:** Cystîs = Sistîs

Pharynx= Farînks

- Her çiqas hinek têgînên bijîşktiyê ji zimanê grekî bêñ jî, lê gelem-periyêñ têgînên bijîşktiyê ji zimanê latînî kokê digirin.

## **ALFABEYA LATÎNÎ**

Alfebaya latînî 21 tîpêñ xwe ji alfabeşa Etruskan hildaye û bi tîpêñ "î" û "v" yê ve têhev ji 23 tîpêñ bingehîn pêk tê.

Lê di çaxa qirna navîn de tîpa "î" veqetiya tîpêñ "î" û "j" yê, tîpa "v" yê jî veqetiya wekî tîpêñ "u", "v" û "w" yê, bi wî awayî alfabeşa latînî gihişt 26 tîpan.

Alfabeya latînî jî wekî alfabeşa me xweyî tîpêñ girdek û hûr-dek e.

A B C D E F G H I J K L M N O P Q R S T U V W X Y Z

a b c d e f g h î j k l m n o p q r s t û v w x y z

- Tîpêñ "Y" û "Z" yê peyvêñ ku koka xwe ji grekiyê werdi-girin hildidin de tê bikaranîn.
- Tîpa "W" yê jî di têgînên cograffik de tê bikaranîn. Di terîmêñ bijîşktiyê de jî bitenê terîmêñ "Eponîm" de tê bikranîn.

Wekî alfabeşen dîtir tîpêñ latînî jî ji tîpêñ dengdêr û dengdaran pêk tê.

**Tîpêñ dengdêr ji şeş tîpan pêk têñ.**

**a, e, î, o, û, y**

**Tîpêñ dengdar jî ji bîst tîpan pêk têñ.**

**b, c, d, f, g, h, j, k, l, m, n, p, q, r, s, t, v, w, x, z**

**Nîşe:** Di Elifbeya Latînî de tîpa "î" yê û tîpa "û" yê wekî (i-u) yê ye. Lê min wekî (î -û)'yê nişan da. Çimkî bilêvkirina den-gêñ( i-u)yê di têgîn û peyvêñ latînî de wekî lêvkirina dengêñ (î -û)ya zimanê kurdî ye.

Yanê têgîna "Masûlke"yê di zimanê latînî de wekî "Musculus" tê nivîsîn û wekî denge kurdî "û"yê tê bilêvkirin. Her wiha dengê "ö û ü yê jî di zimanê kurdî de bi tîpa "u" yê ve tê nişandan. Ji bo vê yekê di nivîsîna peyv û têgînên latînî de ew her sê deng wekî rîbaza zimanê kurdî hatin bikaranîn û nişandan.

### **Pevdengê (dîftong) Alfabeya Latînî**

Taybetiya pevdengê latînî ewe ku ji du tîpêñ dengdêr pêk tên. Yanê du tîpêñ dengdêr tên jiberhev, wekî yek dengî tên xwendin. Ji wan pevdengan a ku en zêde tê baikaranîn "ae" ye.

"ae" wekî "e" tê xwendin û tê bilêvkirin.

"oe" wekî "u" tê xwendin û tê bilêvkirin.

"aû" wekî "o" an jî wekî "av" tê xwendin û tê bilêvkirin.

"eû" wekî "u" an jî wekî "eu" tê xwendin û tê bilêvkirin.

"eî" wekî "eî" tê xwendin û tê bilêvkirin.

"ûî" wekî "ûî" tê xwendin û tê bilêvkirin.

## **BILÊVKIRİNA TÎPÊN LATÎNÎ**

### **Bilêvkirina tîpêñ dengdêr**

- Tîpêñ mîna **a, e, o, û** wekî dengêñ kurdî tên bilêvkirin.
- Dengdêra "î" yê jî li rex tîpêñ dengdar wekî "î" ya kurdî, lê li rex tîpêñ dengdêr jî wekî "y"yê tê bilêvkirin.

**Mînak:** Întestînûm=Întestînûm

**Mînak:** Excavatîo = Ekskavasyo

- Tîpa "y" yê wekî "î" tê bilêvkirin.

**Mînak:** Cystîs = Sistîs

Pharynx= Farînks

## **Bilêvkirina pevdengan**

- Pevdenga “ae”yê wekî “e” tê xwendin.

**Mînak:** Caecum- Secum

Venae - Vene

Arteriae- Arterie

- Pevdenga “au”yê wekî dengê “o” an jî dengê “av” tê xwendin.

**Mînak:** Auricula = Aurikula

Autonomicus = Otonomikus

- Pevdenga “eu”yê wekî dengê “u”yê tê xwendin.

**Mînak:** Neuron = Neuron

- Pevdenga “oe”yê wekî “u” tê bilêvkirin

**Mînak:** Coeliacus - Splenicus Oesophagus - Usofagus

Bilêvkirina dengdarên mîna; **b, d, f, h, k, l, m, n, p, r, s, v, z** wekî dengên tîpêñ kurdî ne.

- Dengdarêñ ku ji lêvkirina kurdî cuda têñ xwendin
- Tîpa “c” wekî dengê “k”yê, an jî wekî dengê “s”yê tê xwendin.

**Mînak:** Tîpa “c” dema ku tê ber tîpêñ dengdar û tîpêñ dengdêr ên mîna “a, o, u” yê wekî “k” tê bilêvkirin. **Mînak:**

Punctum = Punktum

Cranium = Kranium

Caput = Kaput

Collum = Kollum

Cutis = Kutis

Dema ku tîpa “c”yê tê ber dengdêrêñ mîna “e, i, y”yê jî wekî “s” tê bilêvkirin

## Mînak:

Processûs = Prosessûs

Cîsterna = Sîsterna

Cystîs = Sîstîs

Eger tîpa "c"yê bê ber pevdengên mîna "ae" û "oe"yê wekî dengê "s"yê tê xwendin.

Mînak: Caecûm = Sekûm Coelîacûs = Sulîacûs

- Bilêvkirina tîpa "g"yê

Tîpa "g"yê wekî tîpa kurdî tê xwendin. Lê dema ku beriya tîpêngê dengdér ên mîna "î" û "e"yê bê wekî dengê "j"yê tê xwendin.

## Mînak:

Ganglîon = Ganglion Vagina = Vajîna

Genû = Genû Gelatîn = Jelatîn

Gîngîva = Gîngîva

Gyrûs = Gîrûs

- Tîpa "j"yê carinan wekî dengê tîpa "y"yê tê xwendin.

## Mînak:

Vena Jûgûlarîs = Vena Yûgûlarîs

Jejûnûm = Yeyûnûm

- Tîpa "q"yê wekî "kû" tê bilêvkirin.

## Mînak:

Quadrîceps = Kûadrîseps

Aqûadûcûts = Akûadûktûs

- Bilêvkirina tîpa "t"yê wiha ye; dema ku tê ber pevdengên mîna "îa", "îe", "îo", yê wekî dengê "s"yê tê bilêvkirin, di rewşêñ din de jî wekî xwe tê xwendin.

## Bilêvkirina pevdengan

- Pevdenga “ae”yê wekî “e” tê xwendin.

**Mînak:** Caecûm- Secûm

Venae - Vene

Arteriae- Arterie

- Pevdenga “aû”yê wekî dengê “o” an jî dengê “av’ tê xwendin.

**Mînak:** Auricula = Aurikula

Autonomicus = Otonomikûs

- Pevdenga “eu”yê wekî dengê “u”yê tê xwendin.

**Mînak:** Neuron = Neuron

- Pevdenga “oe”yê wekî “u” tê bilêvkirin

**Mînak:** Coeliacus - Sullakûs Oesophagus - Usofagûs

Bilêvkirina dengdarên mîna; **b, d, f, h, k, l, m, n, p, r, s, v, z** wekî dengên tîpêñ kurdî ne.

- Dengdarêñ ku ji lêvkirina kurdî cuda têñ xwendin
- Tîpa “c” wekî dengê “k”yê, an jî wekî dengê “s”yê tê xwendin.

**Mînak:** Tîpa “c” dema ku tê ber tîpêñ dengdar û tîpêñ dengdêr ên mîna “a, o, u” yê wekî “k” tê bilêvkirin. **Mînak:**

Punctum = Punktum

Cranium = Kranium

Caput = Kaput

Collum = Kollum

Cutis = Kutis

Dema ku tîpa “c”yê tê ber dengdêrêñ mîna “e, i, y”yê jî wekî “s” tê bilêvkirin

## **Mînak:**

**Pro~~cess~~sûs = Pro~~cess~~sûs**

**Cîsterna = Sîsterna**

**Cystîs = Sîstîs**

Eger tîpa "c"yê bê ber pevdengên mîna "ae" û "oe"yê wekî dengê "s"yê tê xwendin.

**Mînak: Caecûm = Sekûm Coelîacûs = Sulîacûs**

- Bilêvkirina tîpa "g"yê**

Tîpa "g"yê wekî tîpa kurdî tê xwendin. Lê dema ku beriya tîpêngê dengdêr ên mîna "î" û "e"yê bê wekî dengê "j"yê tê xwendin.

## **Mînak:**

**Ganglîon = Ganglion Vagîna = Vajîna**

**Genû = Genû Gelatîn = Jelatîn**

**Gîngîva = Gîngîva**

**Gyrûs = Gîrûs**

- Tîpa "j"yê carinan wekî dengê tîpa "y"yê tê xwendin.**

## **Mînak:**

**Vena Jûgûlarîs = Vena Yûgûlarîs**

**Jejûnûm = Yeyûnûm**

- Tîpa "q"yê wekî "kû" tê bilêvkirin.**

## **Mînak:**

**Quadrîceps = Kûadrîseps**

**Aqûadûcûts = Akûadûktûs**

- Bilêvkirina tîpa "t"yê wiha ye; dema ku tê ber pevdengên mîna "îa", "îe", "îo", yê wekî dengê "s"yê tê bilêvkirin, di rewşêngî din de jî wekî xwe tê xwendin.**

### **Mînak:**

**Adventîtîa** = Adventîsyâ

**Artîcûlatîo** = Artîkûlasyo

**Spatîum** = Spasyûm

**Tîbîa** = Tîbîa    **Trachea** = Trakea

- Bilêvkirina tîpa "X"yê wekî dengê "KS"yê tê xwendin.

### **Mînak:**

**Axîs** = Aksîs    **Xyphoîdeûx** = Ksîfoîdeûs

- Bilêvkirina pevdengên ku ji du tîpêñ dangdar pêk hatine
- Pevdenga "Ch"yê wekî dengê "k"yê tê bilêvkirin.

### **Mînak:**

**Chorda** = Korda

**Chylûs** = Kîlûs

- Pevdenga "Ph"ê wekî dengê "f"yê tê bilêvkirin

### **Mînak:**

**Phalanx** = Falanks

**Pharynx** = Farînks

- Pevdenga "ps"yê wekî dengê "ps"yê An jî wekî "pîs"ê tê xwendin.

### **Mînak:**

**Psoas** - **Psoas** an jî **Pisoas** tê bilêvkirin.

- Cot tîpa dengdar "rh" wekî dengê "?"yê tê bilêvkirin.

### **Mînak:**

**Rhînencephalon** = Rînensafalon

**Rhomboîdeûs** = Romboîdeûs

- Pevdenga "Th"ê wekî "t" tê xwendin.

## **Mînak:**

### **Thalamûs = Talamûs**

- Pevdenga “sch”yê a ku ji sê tîpan pêk tê ‘jî wekî dengê “ş”yê tê bilêvkirin.
- **Mînak:** Îschîum= Îşîum                      Îschîadîcûs=Îşîadîkûs

### **Di zimanê latînî de cureyên peyvan:**

Di zimanê latînî de 8 cure peyv hene.

- Navdêr (Nomen sôbstantîvûm)
  - Rengdêr (Nomen adjectîvûm)
  - Cînavk (Pronomen)
  - Lêker (Verbûm)
  - Hoker (Adverbûm)
  - Daçek (Preposîtîo)
  - Gihanek (Conjûncîtîo)
  - Baneşan ( Înterjectîo)
- **Navdêr (Nomen sôbstantîvûm)**

Di zimanê latînî de jî wekî zimanê kurdî yekjimarî, pirjimarî û zayend heye. Her wiha şûna vegetandekan rewş û halên navdêran têñ bikaranîn.

- **Ji aliyê pirjimar û yekjimariyê ve zimanê latînî;**
  - a) Sîngûlarîs (yekjimar)
  - b) Plûralîs (pirjimar)
- **Ji aliyê taybetiyêñ rewşen navdêran ve zimanê latînî ;**
  - a) Rewşa xwerû(Nomînatîvûs) yê navdêran - **Kî-**
  - b) Rewşa “Genetîvûs” a navdêran - **Yê û ya Kê-**

### **Mînak:**

**Adventîtîa** = Adventîsyâ

**Artîcûlaçîo** = Artîkûlaşyo

**Spatîum** = Spasyûm

**Tîbîa** = Tîbîa    **Trachea** = Trakea

- Bilêvkirina tîpa "X"yê wekî dengê "KS"yê tê xwendin.

### **Mînak:**

**Axîs** = Aksîs    **Xyphoîdeûx** = Ksîfoîdeûs

- Bilêvkirina pevdengên ku ji du tipêngê dangdar pêk hatine
- Pevdenga "Ch"yê wekî dengê "k"yê tê bilêvkirin.

### **Mînak:**

**Chorda** = Korda

**Chylûs** = Kîlûs

- Pevdenga "Ph"ê wekî dengê "f"yê tê bilêvkirin

### **Mînak:**

**Phalanx** = Falanks

**Pharynx** = Farînks

- Pevdenga "ps"yê wekî dengê "ps"yê An jî wekî "pîs"ê tê xwendin.

### **Mînak:**

**Psoas** - **Psoas** an jî **Pîsoas** tê bilêvkirin.

- Cot tîpa dengdar "rh" wekî dengê "î"yê tê bilêvkirin.

### **Mînak:**

**Rhînencephalon** = Rînensafalon

**Rhomboîdeûs** = Romboîdeûs

- Pevdenga "Th"ê wekî "t" tê xwendin.

## **Mînak:**

### **Thalamûs = Talamûs**

- Pevdenga “sch”yê a ku ji sê tîpan pêk tê ‘jî wekî dengê “ş”yê tê bilêvkirin.
- **Mînak:** Îschîum= Îşîum                      Îschîadîcûs=Îşîadîkûs

### **Di zimanê latînî de cureyên peyvan:**

Di zimanê latînî de 8 cure peyv hene.

- Navdêr (Nomen sôbstantîvûm)
- Rengdêr (Nomen adjectîvûm)
- Cînavk (Pronomen)
- Lêker (Verbûm)
- Hoker (Adverbûm)
- Daçek (Prepositîo)
- Gihanek (Conjûncîtîo)
- Baneşan ( Înterjectîo)
  
- **Navdêr (Nomen sôbstantîvûm)**

Di zimanê latînî de jî wekî zimanê kurdî yekjimarî, pirjimarî û zayend heye. Her wiha şûna veqetandekan rewş û halên navdêran têñ bikaranîn.

- **Ji aliye pirjimar û yekjimariyê ve zimanê latînî;**
  - a) Sîngûlarîs (yekjimar)
  - b) Plûralîs (pirjimar)
- **Ji aliye taybetiyêñ rewşen navdêran ve zimanê latînî ;**
  - a) Rewşa xwerû(Nomînatîvûs) yê navdêran - **Kî-**
  - b) Rewşa “Genetîvûs” a navdêran - **Yê û ya Kê-**

- c) Rewşa "Accûsatîvûs" ya navdêran - Kê-
- d) Rewşa "Datîvûs" ya navdêran - Ji kê û çi re -
- e) Rewşa "Ablatîvûs" a navdêran - ji kê û çi de-
- f) Rewşa "banglêkirinê" "(Vocatîvûs)-Baneşanê-

Di termonolojiya bijşktiyê de wekî bigelempêrî rewşa navdêran a xwerû "kî" ango **nomînatîvûs** û rewşa "yê û ya kê" ango **genetîvûs** tê bikaranîn.

- Di zimanê latînî de ji aliyê taybetiyên zayendî ve rewşa navdêran;
  - a) Mascûlnûm (Nêrtî)
  - b) Femînînûm (Mêtî )
  - c) Neûtrûm (Bêzayendî )

**Hinek taybetiyên avarte hebin jî, navdêr li gorî paşqer-tafêñ ku werdigirin, wekî gelempêrîke li jêrê nişan di-din:**

- Navdêrên ku bi qertafa "ûs"ê ve dawî dibin wekî nêr in.
- Navdêrên ku bi qertafa "a" yê ve dawî dibin wekî mê ne.
- Navdêrên ku bi qertafa "ûm" ê ve dawî dibin wekî bêza-yend in.

Rewşa xwerû ango "Kî" ya Navdêrên Mascûlnînûm bigelempêrî bi qertafa "ûs"ê ve dawî dibin.

**Mînak :**

- Mûscûlûs
- Nervûs

Rewşa "Yê û ya kê" (=Genetîvûs) ya Navdêrên Mas-cûlnînûm jî bigelempêrî bi qertafa 'î"yê ve dawî dibin.

## Mînak :

-Mûscûlî

-Nervî

## DI ZIMANÊ KURDÎ ZARAVAYÊ KURMANCÎ DE PIRJIMARÎ

Di zimanê kurdî zaravayê kurmancî de; ji bo pevv û têgînên xwerû pirjimarî di nav hevokê de bi alîkariya lêkerê tê diyarkirin.

Wekî mînak:

Bijîşk diran **kışand**.

Bijîşk diran **kışandin**.

Her wiha di zaravayê kurmancî de ji bo pirjimariyê zayend nîn e.

Ji bo pirjimariya nenasîyê paşqertafa “in” an jî hokera “hin” tê bikaranîn.

**Mînak:** Li ser arikan **diranin** hene.

Li ser arikan **hin** diran hene.

Ji bo pirjimariyê qertafa veqetandekê binavkirî “en”, qertafa veqtendeka nebinavkirî “ine”, qertafa nensaiyê “hin”, qertafê tewangê “an” û “inan” tê bikaranîn û pirjimarî pêk tê.

**Wekî mînak:**

Masûlkeyen pişt ji hêla tûreyên spînal ên servîkal û torakal têni hişyarkirin.

